DILBIRÎN DILO

# LÎZA

Helbest



WEŞANXANEYA ÇANDNAME

**WEŞANXANEYA ÇANDNAMEYÊ**

Rêza Edebî-2
Helbest

**NAVÊ PIRTÛKÊ**

Lîza

**NIVÎSKAR**

Dilbirîn Dilo

**MÎZANPAJ**

GrafîKURD

**DÎROK**

Cotmeh-2020

***“Ji bo rihên ji azadî azad in”***

*Dilbirîn Dilo*

*dilbirindilo40@gmail.com*

*01.10.2020*

## NAVEROK


Lîza........................................4

Bêrî Kirin Çi Ye?.............................6

Çi Heye Li Welatê Min...............7

Însanetî Mir................................8

Çima Kurdistan........................10

Ez Bûme Pêxemberê Derd û Xeman!.............................................11

Nîvê Şevê..................................12

Tu Bibe.....................................13

Ez Bi Hêvî Me...........................14

Hêvî û Mirin.............................16

Bi Nebûna Te............................18

Heke Tu Nebûya.....................20

Kûçikek Mirî.............................22

Întîxara Helbestvanekî...........23

Dengek.......................................24

Ez Îro Dîsa Mirim...................25

Evîn Çi Ye?...............................26

Kenê Te.......................................27

Ez Hesûd ım.............................28

Helepçe.......................................29

Tu.................................................30

Evîna Kûçikî..............................34

Di Dû Te Re.................................35

Ez Penaber im...........................37

Min Xwest....................................38

Gul..................................................39

Serxweş im..................................40

Şêxê Evînê..................................41

Ez Bê Kes im..............................42

Bajarê Min..................................44

Mirin............................................45

Hez Bi Hez Tu...........................47

Ez Li Te Digerim......................48

Welatekî Dixwazim...................50

Dosto!..............................................51

Ez Ditirsim..................................53

Însan.............................................54

Ez Hatim Kuştin........................55

Dema Ku Ez Mirim...................56

Ez Nikarim.................................57

Mirina Belaş...............................59

Mirina Nemir.............................60

Ez Çûm.........................................62

Were.............................................63

## LÎZA

Di berbanga şeveqê de mela bang dide
Ez jî sela dixwînim ji rihê xwe yê çilmisî re
Rihê xwe di nava hestên şikestî de binax dikim
Bira li ser berkoleyê min bi destê te 'hezkiriyê Lîzayê' binivîsin
Kî hat bira bi devê te bi dengê te fatiheyek bixwîne ji rihê min ê bêxwedî re Lîza

Bira roj li me dernekeve Lîza
Bira wan xebînetên me bi hev re kirine eşkere nebin
Heke eşkere bibin wê ez ê bêm recim kirin
Wê demê bira bi xwîna min "Ev laş ne bê xwedî ye qurbana Lîzayê ye" binivîsin Lîza.

Lîza
Lîza huş be, deng neke guh bide dengê dengbêj
Bi qirika Serhedkî
Bi gale galê Behdînanî
Bi meqamê Botanî
Kilama min û te dibêje Lîza
Dibêje "Ev xortê belengazê mehrûmê bêkes evîndarê Lîzayê ye" Lîza

Lîza

Di bin bedena Amedê wê miriyek bê dîtin, ew ez im, min xwe kuşt

Bira laşê min berhev nekin tenê bira binivîsin ‘kuştiyê Lîzayê ye.’ Lîza

Lîza

Wê di dosyayên qereqolan de navê min bibînin kujer, diz, xapînok tu li wan sûcan zêde bike ‘evîndarê Lîzayê’ binivîs Lîza

## BÊRÎ KIRIN ÇI YE?

Bêrîkirin çi ye?

Dûr ketin e?

An birîn e?

Bêje

Bêrîkirin çi ye?

Hezkirin e?

An xem xwarin e?

Bêje

Bêrî kirin çi ye?

Evîn e an mirin e?

Bêje bêrî kirin çi ye?

## ÇI HEYE LI WELATÊ MIN

Di bin siya çekan de helbest nayên nivîsîn

Di kolanên xerabe de lîstik nayê lîstin ku zarok bilîzin

Di lîstika zarokên welatê min de bêhna mirinê

Laşên birîndar hene

Di hêviya dayikên porkur de şervanên çekdar hene

Di xeyalên keçikên kezîzer de rojên bê mirin hene

Di welatê te de çi heye;

Mirin?

Xwîn?

Birîn?

Gazin?

Qêrîn?

Çi heye di welatê te de

## ÎNSANETÎ MIR

Dengê selayê tê

Îro ne în e jî

Ka gelo kî miriye

Çawa miriye

Dibêjin mirovahî miriye

Çavên we rohnî bin

We mirovahî kuşt

We mirî bi xwînê şûşt

Bi xiyanet û bêbextî kefen kir

We nimêja mirî kir

Lê desmêja we bi xwînê bû

Ma desmêj bi xwînê dibe

We heqê xwe helal kir

Lê wî helal nekir

Bi dilmayî çû ji nav we

We bir nava goristana bîrê

Lê we tenezul nekir wî binax bikin

We ew havêt hundirê newaleke gemmar, bi xwîn, nêm û kêmê

Mela telqîna mirovahî dida

“Mirovahî tu tiştek nebêjî ji wan re ha”

Mirovahî bê deng bû lewra miribû

Pir kes ji we di bin simêlan de dikeniya

Çavê we rohnî bibe

We însanetî kuşt

## ÇİMA KURDISTAN

Hoo!  dîrok tu şahid î

Bibêje

Çend sal û demsal di ser min re derbas bûn

Çend zarokên min bê mal, bê hêvî man di payîz û zivistanên bêbext de

Hoo! çiyano hûn bibêjin

Çend malbatên min ên talankirî xwe spartin we

Çend keç û xortên min di lûtkeyên we de di bin berfê de man

Hoo! Dîjle hoo! Firat hûn bibêjin

Çend zarokên min xwîna xwe bi ava we re herrikandin bi rengê xwîna xwe hûn boyax kirin

Hoo! darno, zinarno hûn bibêjin

Çend pîrên min ên extiyar di bin we dirazin

Hoo! kevirên min, ho! axa min hûn bibêjin

Çend evîn nîvco man li ba we

Hoo! Xwedêyo tu bibêje

Ma ne bes e çend ezmûn min derbas kirin

Hêna jî dojeha min xelas nebû?

Hêna çend qîzên xwe yên bakîre ji te re bikim qurban?

Hoo !cihan tu bibêje

Ka ez Kurdistan bûm, bûka te bûm çima te namûsa xwe di bin lingên dagirkeran de hişt?

## EZ BÛME PÊXEMBERÊ DERD Û XEMAN!

Ez bûme pêxemberê derd û xeman

Kitêbeke perçe kirî nîvcomayî ji min re peya bû

Ez bûme pêxemberê derd û xeman

Ayeta ewil ji hevbûna evîndaran

Ez bûme pêxemberê derd û xeman

Di peyamên min de tenêtî, dûr ketin û hesret

Ez bûme pêxemberê derd û xeman

Li ser zimanê min stranên xemgînî û hêviyên hêvîbirî

Ez bûme pêxemberê derd û xeman

Di destê min de pênûsek şikandî kaxizek qetandî

Ez bûme pêxemberê derd û xeman

Di xeyalên min ên bela bela de evînên negihîştin miradan hene

Ez bûme pêxemberê derd û xeman

## NÎVÊ ŞEVÊ

Wext nîvê şevê ye

Şev tarî

Şev kambax

Û ez

Dîsa bi tenê me

Hîveke nîvco

Çend stêrkên bela bela li asîman daleqandî

Dîsa şevek bê deng

Pênûs şikestî

Kaxiz perçe bûyî

Çîrok nîvco

Stran xemgîn

Û dîsa di hişê min de tu

Serma, seqem, ba, bahoz, tofan û ez, li der  im

Xwe bi xeyalên te germ dikim

Bi xeyalên te; tenêtiya xwe diqedînim xelas dikim dikujim

Şevekî tarî dîsa bê te bi dawî bû

Û rojê dîsa ez bê te, bi tena serê min ez girtim

Ba û bahoz dîsa di ser min re derbas bûn lê dîsa tiştek bi xeyalên min nehat

## TU BIBE

Tu bibe hûrbaranek bi mijdûman û di çol û beyarên dilê min de bibare
Bibe berfek spîsar û li lûtkeyên çiyayê hêviyên min de bibare
Bibe agirek newrozî û tarîtiya şevên xeyalên min rohnî bike
Bibe tiroja rojeke tirmehî û cemeda xewnên min bihelîne
Bibe ewreke reş tarî li ser erda evîna min bigere
Bibe bilbilek stranbêj û di gulîstana çavên min de bixwîne
Bes tu bibe û ji min dûr nebe
Bes tu bibe û li ba min be

## EZ BI HÊVÎ ME

Ez bi hêvî me

Wê rojek bê

Wê ev gel hişyar bibe

Ji xewa giran

Wê textê xwînmijan daxîne

Zaliman binax bike di axa xwe ya beyar de

Dê Mesîhek ji bo vî gellî jî rabe

Em ê jî rizgar bivin xelas bivin

Hûnê me jî nas bikin bê ka em kî ne

Neviyê Rustemê Zal, Şêx Seîdê kal

Seyyid Riza û Mihemmed Qazî ne

Xwediyê warê bav û kalan

Çiyayê Şengal û Mishefa Reş

Dengê dengbêjan dê olan bide li lûtkeyên çiyayên bilind

Dê Kurdistan bibe gulîstan

Wê bibe yek perçe

Wê pênc zarokên wê bibin yek

Dê rabin zarokên Îbrehîm Xelîl

Hevalên nebi Îsa, Mûsa û Mihemmed

Dê bilbil dîsa rizgar bibin ji qefesên zingargirtî

Wê şêr dîsa bera roviyan bidin ji daristana xwe

Wê ev axa pîroz jî bibe welatek azad

Wê zarokên Kurdistanê azadî bînin cihanê

Ez bi hêvî me

## HÊVÎ Û MIRIN

Her şefeq tu radibûy te berê xwe dida rojhilat û te li zayîna rojê mêze dikir.

Bi zayîna rojê rûyê te rohanî dibû û kenek zirav dihat li ser lêvê te yên qerqaşî cih digirt

Ronahiyek ronî dihat di çavên te de rûdinişt

Dest û lingên te diricifîn mîna pelên dareke sed salî

Lê ne zivistan bû, ne jî serma hebû

Kêfa te dihat lê em nizanibûn çi kêf bû

Me nizanibûn rojê mizgîniya çi dabû te û xwedê ji te razî be, te jî ji me re nedigo ka çi mizgînî ji te re hatiye

Em jî di miraqeke bê dawî de diman

Bi vê kêfê

Te stranên kêf û şahiyê distirand

Bi kêfxweşiya te em jî kêfxweş dibûn û bi lez û bez bi lîstikî me kar û barê xwe dikir

Ew roj ji me re dibû cejn û îd

Lê dîsa em tê nidigihîştin ku ew kêf kêfa çi bû

Dema roj diçûn ser ava

Te dîsa berê xwe dida rojê

Û em dîsa diketin nav miraqên bê dawî û me li te temaşe dikir

Ka wê dîsa çi bibe

Ev car jî kenekî dihat li ser devê te lê kenekî stûxwar û giran bû

Hema dîsa li te dihat

Bes tu bikeniya bibişiriya wê tim li te bihata

Aramiyek mirov ditirsîne dihat li ser riyê te

Çavên te li dûrahiya rojê mêze dikir

Rindikên teyên stêrkî xwe berdidan ser hinarikên te yên sor û nerm

Mîna fîsa roj xebereke bide te

Xebereke ne baş

Xebereke kabûs

Em jî bi vî halê te yê ne baş diketin nava şînê û me jî di reşahiya şevê de rondikên xwe dirijand.

Dîsa em li der dora ar kom dibûn

Stranên evînî, hesretî, belengazî, xurbetî li ser zimanê dîlan digirt

Anuha têdigihêşim zayîna rojê mizginiya hêviyê

Avabûna rojê xebera mirinê dide

## BI NEBÛNA TE

Nizanim bê te çawa dijîm
Jiyanek bê te dijîm
Êdî tu bifikire çawa dijîm
Bi nebûna te
Ez bûme
Bahareke bê gul
Bi nebûna te
Ez bûme
Çiyayekî bê dar û berf
Bi çûyîna te
Ez bûme
Berdûşekî dîn
Bi nebûna te
Ez bûme
Şeveke bê stêrk
Bi nebûna te
Ez bûme
Ewreke bê baran
Bi çûyîna te
Ez bûme rojeke bê tîr
Bi çûyîna te

Ez bûme Sûryaniyek bê mey

Û ez bûme kalekî rîspî

## HEKE TU NEBÛYA

Heke ne tu bî

Ez ne tiştek im

Heke ne tu bî

Ez ne ez im

Ez nînim

Erê her çiqas ez belengaz, ez bê te û ez jê mehrûm bim jî

Dîsa bi hebûna te ez ji tunnebûnê xalî me

Heke ne tu bî cihan jî nedibû

Her tişt bi hebûna te heye

Te tîne bîra min cumle yên hene

Şev çavên reş

Roj rûyê te yê gewr

Behr awirên te yên bê dawî

Ezman bişirînên te

Tînin bîra min

Kevir, ax, av, zinar, dar

Her tişt, her tişt

Te tîne bîra min

Heke ne tu bû ya

Evîn jî nedibû

Evîn xwe bi rengê te dixemilîne

Rengê her tiştî ji rengê te ye, ji bêhna te ye, ji dengê te ye

Hebûna te

Hebûna te ye

Ya ku min dike ez

Ya ku min ji min dûr dixe

Min ber bi min ve tîne

Hebûna te ye

Hebûna te ye, ya ku îlhama afirandinê dide Xweda!

Xweda tu afirande

Û cihan jî kir eqsa te

Dilê min kir beranek û ser jê kir ji te re kir qurban

Heke tu nebûya

Wê tunnebûn jî nebûya

## KÛÇIKEK MIRÎ

Kûçikek miribû

Çima miribû

Kê kuştibû

Hinekan digo nexweş bû

Hinekan digo kûçikan kuştiye

Hinekan jî digo însanên ne însan ew kuştine

Bi jehra ji jehra mejiyê wan hatiye çê kirin kuştine

Ka vî rebenî çi kiribû

Dev li kê kiribû

Kî gez kiribû

Ev kûçikê belengaz, feqîr jar

Û gula mehlê

Çi zirara wî gihîştibû we

We çi jê xwest

We çima ew kuşt

Ma hûn jî kûçik bûn “heşayê kûçikan”

Hevala wî, cewrên wî ji bê kesiya xwe re, ji neçariya xwe re digiriyan

Ez ji neçariya wan re, ji ne însanbûna we re giriyam

L’enet were li we

L’enet bê li we

## ÎNTÎXARA HELBESTVANEKÎ

Dîsa helbestvanek xwe kuşt
Çi ji xwe paş ve hîşt?
Çar hêtîm
Jinebiyek sîh û pênc salî dêya çar hêtîman
Û sê jinên qehbik
Di berîka wî de bîst û pênc panod
Şalekî kevin, pîne kirî
Kincek diriyayî
Û pênsed û huvdeh helbest
Çi bi xwe re bir gorê?
Kul û kederên ne temam
Bê welatiyek stûxwar
Belengaziyek şikestî
Û sê mîtro kefenê bi deyn
Û bê kesiyek bêkes

## DENGEK

Dengek dihat ji dûr û kûr de

Deng digo

Neçe, tu bi ku ve diçî

Bise min tenê nehêle

Min bê kes nehêle

Bi hesreta te û bi xeyalên te yên derewîn re nehêle

Min goh neda wî dengî

Û ez çûm

Min li paş xwe jî mêze nekir

Mîna wan kesên ku ez bi tena serê xwe hiştim min jî ew deng hişt

Ez jî bê kes û belengaz mabûm

Kesê ji min, ji derdê min fêm nedikir

Ma ez jî ne mîna wan bûm

Ne însan bûm

Çima ji min fêm nekirin

Û ez jî bûm fena wan

Êdî ez jî ji kesê

Ji dengên anonîm

Ji dengên bê dengiya min tînin bîra min fêm nakim

Ez jî bûm bê deng û kerr

## EZ ÎRO DÎSA MIRIM

Ez îro dîsa mirim

Mirinek bê hempa

Kambax, giran û bêhn kotî

Lê ji min re xweş

Ronî û bêhn emberî

Ez îro dîsa mirim

Bi awirek tûj

Lê ne bi êş

Mirin jî bi min re mir

Ez îro dîsa mirim

## EVÎN ÇI YE?

Ji min ra behsa evînê bike

Evîn çi ye

Ji min ra behsa Mem û Zîn bike

Evîn bê miradi ye

Ji min ra behsa Dewrêş û Edûle bike

Evîn mirin e

Ji min ra behsa xatûna Zembilfiroş bike

Evîn hewldana gunehan e

Ji min ra behsa dengbêjan bike

Evîn sitrandina kilaman e

## KENÊ TE

Bi min nekene

Kenê te xapînok

Kenê te dijmin

Li min nenêre

Awirên te hişk

Awirên te kujer

Ji min dûr nekeve

Dûrbûna te kul

Dûrbûna te keder

Tenê ji min hez bike

Hezkirina te pêçek e ji birînê min ra

Hez kirina te hişyarî ye ji min ra

Tenê a min be

Tenê bi min ra be

Tenê a min

## EZ HESÛD IM

Ez hesûd im

Hesûdê te

Hesûdê evînê

Ez hesûd im

Hesûdê evîndaran

Hesûdê xoşewistan

Ez hesûd im

Û ez şanaz im bi hesûdiya xwe

Tu zanî?

Ez te bi bîr tînim

Her ku du xoşewîsatan li gel hev dibînim

Ez hesûd im

Wan kulîlkan dihesûdim

Ez hesûd im

Were bila hesûdiya min bi dawî be

## HELEPÇE

Yadê bêhna sêvan tê

Kurê min, ew ne sêv in

Ew mirin e

Ew komkujiya me ye

Yadê çima xuşka min deng nake

Kurê min ew raza

Ew çû bihuştê

Yadê çima xewna min tê

Kurê min ew ne xewn e

Ew şerbeta mergê ye

Hawar hawar hawar

Çima gundê min şênî bêdeng e

Hawar hawar hawar

## TU

Çavên min li rêya te dûr diqelişe
Ma êdî tu nayê
Axa mina zuha şil nakî
Dilê min tî, av nadî bi lêvên xwe yên bi meya evînê şil bûne
Û tu min têr nakî bi maçên xwe yên şekirîn
Pozê min li bêhna te digerin li her welat û asîman û bêhna her jinê de
Tu li her derê yî, li ser her rêyî, li ser perava her kaniyê de, li lûtkeyê her çiyayî de, di bin sî û pelên her darî de, di bêhna her gulê de, di bin her zinar û kevir de, di bin baskê her kevok û kew û bilbil û çûkê de, di nava her rûpelên her pirtûkê de, li ser zimanê her dengbêj û çîrokbêjî de yî
Tu li her dere yî li her derê
Di her nuqteya jiyana min de tu heyî
Ma ne bes e, te ez tenê bi xeyalên te yên derewîn re hiştim
Min bêriya te kir
Her rûyê her jinê dibû rûyê te
Bejna her jinê dibû bejna te
Her jin di qama te de bû
Dengê te li ser zimanê her jinê bû
Rengê te li ser çermê her jinê bû
Her jin dibû tu û min jî bi navê gazî wan dikir Rinda'm

Her jin bi kenê te dikeniyan ji min re

Porê her jinî bûbû porê te yê kezîkirî

Tevger, rêçûn, rabûn û rûniştina temmamê jinan dibûn ê te

Ma qey ne bes e êdî tu nayê?

Ez bûbûm şîzofrenekî evîndar

Li her derê tu bûy

Li rastê'm, li çepê'm, li pêş'im, li paş min li her derê li her derê tu yî

Were were were

Êdî nikarim bi xeyalên te re bijîm were

## HELBESTVANEK

Carina di fikr û xeyalên kûr de
Carina di roj û heyv û rêyên dûr de
Carina di dev lêvên germ û şêrîn de
Carina di çîrokek nivcomayî de
Carina di pênûs û kaxizek sipî de
Carina di rî û porê reş de
Û carina jî di nava çol û beyarên bê av de
Helbestvanekî nenas hebû
Helbestên bê nav dinivîsand
Behsa evînên ne temam dikir
Carina li lûtkeya çiyayek bilind de
Carina di nava behrekî bêdawî de
Carina di bin dareke kal de
Carina jî cîranê rojê bû
Helbestvanekî bêkar hebû
Carina dibû sitêrk bi asîman ve dadileqiya
Carina dibû mehsî di behran de digeriya
Carina dibû kevokek azad li ser welatên xerîb difiriya
Carina jî dib marek î û li ser axa sar digeriya

Helbestvanekî belengaz hebû

Carina di qêrîna keçikek neçar de

Carina di girîna zarokek sêwî de

Carina jî di zimanê evîndarekî bê hiş de

Helbestvanekî neçar hebû

## EVÎNA KÛÇIKÎ

Dema ku pirsa min ji te kirin
Bêje mîna kûçikan ji min hez kir
Û mîna kûçikekî bê xwedî mir
Ji xwe evînî kûçikî nîne?
Ez jî bûm evîndar
Ez jî bûm kûçik

## DI DÛ TE RE

Kes li ba min nema
Her kes ji min dûr ket
Kesê silavek germ jî bide min nema
Di dû te re
Ti jinekê paxila xwe ji min re ve nekir û ez hembêz nekirim
Ez ramûsanek şêrîn neda min û ji min hez nekir
Di dû te re
Dinya li min tarî bû
Ewrên ezman li min giran bûn
Sitêrkên şevên min hilweşiyan
Şev û rojên min tev tarî bûn
Di dû te re
Havîn li min germ nabe
Zivistan li min sar nabe
Bahar û payîzên min wek hev in bê hêvî ne
Sal û demsal nahrikin
Roj li min germ nake
Hîv li min der nakeve
Di dû te re
Ez bûm kewekî bê heval
Kevokek per şikestî

Ez, kerr, kor, lal û bê hiş bûm
Di dû te re

Ez çend car li întîxarê fikirîm
Lê mirin jî êdî bê tehm bû
Nizanim çi bikim, çawa bikim
Bi ku ve biçim
Li ku bijîm
Di dû te re
Tehm ti tiştek jî nemaye
Ne tehma nan, ne jî a avê ma
Êdî tehma dev û lêvên şekirîn jî nema
Ez bûm nexweşê nav cillan
Ez bê kes û bê hêvî mam
Ez bûm hesretiyê xewn û xeyalên kûr
Di dû te re

## EZ PENABER IM

Ez penaber im di welatê xwe de

Lewra zimanê min qedexe ye

Ez penaber im di welatê xwe de

Lewra fikr û ramanên min qeyd û zincîrkirî ne

Ez penaber im di welatê xwe de

Lewra helbestên min bê wate dimînin

Ez penaber im di welatê xwe de

Lerwa ez kevok im û ez nikarim di asîmanê welatê xwe de azad bifirim

Ez penaber im di welatê xwe de

Lewra ez nikarim ji zarokên xwe re çîrokan bibêjim

Ez penaber im di welatê xwe de

Ez penaber im

## MIN XWEST

Min xwest ku ez di çavên te yên şîn mîna beherekî kûr in de bifetisim
Û min xwest ku ez di nava porê te yê zer mîna roja Tirmehî de wenda bibim
Min xwest ku ez ji dûr de ji te hez bikim
Mîna bilbila hefsiya qefesê û hezkiroxê gulê ye
Min xwest ez mîna cemeda ku li ber tavê dihele li ber te bihelim
Û min xwest ku ez bimirim û di gora dilê te xwe veşêrim.

## GUL

Kê gotiye bi guleke buhar nayê

Min gul heye buhayê temamê gulistanê cîhanê ye

## SERXWEŞ IM

Mest û serxweş û sekran im
Ne vexwarê eraq û mey şeraban im
Tenê nexweşê ramûsana dev û lêvan im

# ŞÊXÊ EVÎNÊ

Şêxê Sen'an im

Şivanê garana berazan im

Vexwarê mey û bade û şeraban im

Ji bo eşqê yê ku dîn guhert ez im

## EZ BÊ KES IM

Ez bê kes im
Bê heval û bê hogir
Di welatê xerîbiyê de
Ez bê kes im
Mîna pezkoviyek neçar
Di dest hov û guran de
Ez bê kes im
Mîna şêrekî birîndar
Mîna teyrekî bask bi birîn
Ez bê kes im
Û ez bi tena serê xwe me
Di nava civata nezan de
Ez bê kes im
Mîna çiyayekî bê berf
Mîna miriyekî bê gor
Ez bê kes im
Mîna asîmanekî bê sitêrk
Mîna pênûsek bê înk
Ez bê kes im
Mîna pirtûkek bê xwendevan
Mîna çîrokeke nehatibe gotin

Ez bê kes im

Û ez bê kes im

## BAJARÊ MIN

Bajarê min bê deng e

Qey çi bûye?

Mirî heye?

Hes ji bajarê min nayê

Çi bûye?

Kî miriye?

Bajarê min bê deng

Bê hes, bê sewt maye

Qey kes di bajarê min de nemaye

Qey bajarê min bê kes ma ye?

Qey bajarê min miriye

Kolan û taxên bajarê min sêwî mane

Deng nayê ji dibistan û parqên bajarê min

Qey bajarê min bûye goristan?

Qey kes di vajarê min de nemaye?

## MIRIN

Te xêr e tu li der dora min digerî
Te dil heye tu min bitirsînî mirin
Tu çi jî bikî ez ji te natirsim
Ma ne bes e
Tu têr nabî
Te kes li der dora min nehîşt
Ne dê û ne bav
Ne xwişk û ne bira
Tu mêr î were li hember min rabe
Bi eşkera
Ne bi dizî
Ma ne bes e
Te ji min girtin
Bûk û zavayên dest bi hinne
Keç û xortên teze û nazenîn
Bi mêranî canê min ji min bixwaze
Ne bi teresî û bê bextî
Ez jî ji te re bibim alîkar
Awirên xwe yên hişk wîsa ber nede bi ser min de
Ez rast dibêjim
Tu bixwazî ez xwe ji çiyayên asê de bavêjim xwarê
Mirin

Tu bixwazî ez jehrê vexwim

Tu bixwazî, ez kevirekî giran bi lingên xwe ve girê bidim û xwe berdim nav behra bê binî

Tu bixwazî ez tifingê bera ser dilê xwe bidim

Bêje çi derdê te bi min re hete

Bi qesem ji te natirsim

Mirin

## HEZ BI HEZ TU

Di vê bajarê kambax da
Kolan bi kolan li te digerim
Gav bi gav tu di hişê min da yî
Rêç bi rêç ji te dûr dikevim
Maç bi maç tu di bîra min da yî
Di vê welatê xerîb da
Mal bi mal, derî bi derî li te digerim
Mirov bi mirov pirsa te dikim

Hembêz bi hembêz te dixwazim
Dar bi dar li kulîlkên te digerim

## EZ LI TE DIGERIM

Ez li te digerim
Di nava pelên daran de
Carna di bin axa hênik de
Carna jî li serê çiyayekî asê de
Û ez te nabînim
Lê ez te dixwazim
Mîna bedewiyekî di nava çolê de
Bê av bimîne û li avê digere
Ez li te digerim
Di nava rûpelên pirtûkan de
Carna di înka serê pênûsekî de
Carna jî di nava helbestên şairekî de
Û ez te nabînim
Lê ez te dixwazim
Mîna kodekî birçî
Li pêsîra diya xwe bigere
Ez li te digerim
Di nava ramûsanên dev û lêvên du evîndaran de
Carna di nava cotê memikên dîlberan de
Carna jî di nava keziya porê keçikek Kurd de
Û ez te nabînim

Lê ez te dixwazim

Û ez zanim tu ne li van deran î

Dîsa ez li te digerim û ez te dixwazim

Ez bi hêvî me

Ez ê te bibînim

Di nava fikr û xeyalên kûr de

Ez ê te bibînim

Ez bi bawer im

Bi baweriya evdekî bixwedayê wî

Ez ê te bibînim

## WELATEKÎ DIXWAZIM

Welatekî dixwazim

Dar û devî kesk bin

Asîman şîn be

Axa wê sor û reş be

Bêyî ku xwîn birêje

Welatekî dixwazim

Kevirên wê bi hêsirên

Dayîkan neyên şûştin

Barana wê ne ji bombe û roketan be

Welatekî dixwazim

Kaniyên wê biherikin bê astengî

Bêhna azadî bê ji baya wê

## DOSTO !

Dosto!

Li min guhdarî bike

Derdê xwe ji te re bêjim

Dosto!

Axa welatê min di bin lingên dagirkeran de dipiçiqe

Nebat û çayîr hêşîn nabin

Dar fêkî nadin

Zevî hêşîn nabin, tene nadin

Dosto!

Ava kaniyên welatê min şolî ne û naherikin

Masî dimirin

Zarok tî dimînin

Ava bin çiyayê min zuha dibin

Ajalên bê av dimînin

Dosto!

Ezmanê welatê min sêwî û hêtîm maye

Kevok û baz aşiqê hev nabin

Lewra helm û bêhna evînê nemaye

Êdî mirin jî bi bêhna sêvan dibare li ser welatê min

Dosto!

Dayîk di welatê min de digirîn û nakenin, nabişirin

Çimkû xort û keçên min tên kuştin û tên der dest kirin

Bêhna xwîn û êsîriyê girtiye li ser welatê min
Dosto!
Dawet û şahî nemaye li ser axa welatê min
Kêf û zewq nemaye
Kesê dîlanê bigire tune ne
Tilîlî nema ji bo şahiyê be
Êdî tenê ji bo şînê ye
Dosto!
Êdî ez nikarim bigirîm jî
Hêsir di çavên min de nemane
Ez ditirsim di welatê xwe de bijîm
Jîn û jiyan qedexe ye
Ez newêrim awaz awaz bikim qêrîn û hawar
Lewra kesê bê hewara min tune
Dosto!

## EZ DITIRSIM

Ez ditirsim

Ji hez kirina te

Ji nêrîna wechê te

Ez ditirsim

Ji nivisîna helbestan

Ji ramûsanên kinik

Ez ditirsim Ji hêviyên hêvîdar

Ji xeyalên ku tu tê de bî

Ez ditirsim

Wê ji destê min bifirin

Wê dîsa min bê hêvî bihêlin

Ez ditirsim

Wê min bi tenê bihêlin

Wê min bikin hesretiyê mirinê

Ez ditirsim

## ÎNSAN

Berî niha ez jî însan bûm

Min însan nas kir

Ez bûm tiştek din

Belkû xweda

Belkû ajal

## EZ HATIM KUŞTIN

Ez hatim kuştin
Di welatê dilê xwe de
Ne bi çek û bombeyan
Tenê bi awrên te yên sar mîna cemed
Ez hatim kuştin
Di bê kesî û xerîbiyê de
Ne bi şûr û kêr û tîran
Tenê bi kenê te yên qehbik
Ez hatim kuştin
Di tenêtiyek bê dawî de
Ne bi balefiran û roketan
Tenê bi destê te bê bavê
Ez hatim kuştin

## DEMA KU EZ MIRIM

Dema ku ez mirim
Laşê min neşonin kefen nekin û ne veşêrin
Ji ber ku ez mirin nexwaz im
Laşê min bişewitînin û bila dû ya min bifire ezmanan û xweliya min bi heft behrî ber bidin
Ji ber ku ez azadîxwaz im
Li ciyê ku ez şewitîm dara gulê biçînin
Ji ber ku ez aştîxwaz im
Dara gulê bi xwîna şehîdan û rondikên çavên dayikên şehîdan av bidin
Ji ber ku ez neteweperwer û welatparêz im
Bila zarok wan gulan bêhn bikin
Ji ber ku zarok pêşeroj in pêşeroj hêvî ne û ez jî hêvîdar im
Bila dagirker nêzê min nebin û ji welatê min dûr bin
Ji ber ku ez zordestî nexwaz im

## EZ NIKARIM

Ez nikarim bêjim min bîriya te kir lê ez dixwazim te bibînim

Ez nikarim bêjim ez ji te hez dikim lê ez dixwazim tu her li gel min bî

Ez nikarim bêjim neçe lê dikim ez dîn bibim

Ez nikarim bêjim tu evîna min î lê rondikên bêdeng dirijînim

Ez nikarim bêjim were lê ji hesreta te dîn dibim

Ez nikarim bêjim tu gula min î lê ez bûme bilbilekî lal û bê deng

Ez nikarim bêjim tu xeyala min î lê tim tu bi min re yî

Ez nikarim bêjim tu delala min î lê dikim xwe bikujim

Ez nikarim bêjim tu karxezala min î lê tim di kemîna te de me

Ez nikarim bêjim tu mêkewa min î lê tim li ber hêlîna te me

Ez nikarim bêjim tu bedewa min î lê nikarim çavên xwe ji veguhezînim

Ez nikarim bêjim roniya çavê min î lê ji xeynê te tiştek nabînim

Ez nikarim ti tiştek bêjim ji bo te lê ji bo te dijîm

Were bibe zimanê vî lal î

Were bibe dilê vî dîn î

Were bibe jiyana vî miriyî

## MIRINA BELAŞ

Di bêrîka min da çend xemgînî yên erzan
Xwe berdidim nav sûka mirinê
Dibînim dagirkerê welatê min bûye bazirgan mirinê difiroşe min
Di dilê min da keserek bê hempa nêzê bazirgan dibim
Dipirsim; bihaya mirinê bi çi ye
Bazirgan; ji hemû cihanê ra bi wereqan ji te û gelê te ra belaş.

Ev sêdar bi çi ye Ji temamê cihanê re bi sûc e ji te û gelê te re belaş.

Min serê xwe kir ber xwe û ez bi xemgînî û fefî vegeriyam nav gelê xwe.
Min mizgîniya mirinê ji wan re hanî.

Ji temamê cîhanê re mirin bi pere û bi maf e ji me re belaş e

## MIRINA NEMIR

Mirinek nemir di hişê minê mirî de dijî

Min bi hebûna xwe dikuje

Dimirim bi nemiriya mirinê

Ew di mirina min de dijî

Bi mirina min dibe nemir

## XEM

Ez bûme keştiya xeman di nava behra derd û kulan de avjenî dikim

Dilê min bûye hêlîna çûkên avis in bi xemgînî û kuştinê

Ruhê min bûye goga ber lingên zemanê bêbext diçe û tê

Gerdûna min bûye tilîliya ser zimanê jinên bî û porkur û bi girîn

## EZ ÇÛM

Ez çûm
Bi xatirê te
Baş li xwe binêre
Baş li kewê binêre
Va ez çûm
Bi tena serê xwe
Bê te
Bi hêvî
Bê ramûsan
Bi girîn
Va ez çûm
Bi xatirê te
Bê kenîn
Bi xemgînî
Bê dil
Bi derd
Ez çûm
Baş li xwe binêre
Baş li kewê binêre
Va ez çûm….

## WERE

Were
Min bi tena serê min nehêle
Min ji xwe mehrûm neke
Min bê te nehêle
Were
Min bê hêvî nehêle
Min ji xwe dûr neke
Min bê xeyal nehêle
Were
Ji min ra bibe cejn
Ji min ra bibe newroz
Ji min ra bibe mihrîcan
Were
Tu yî ji min ra hêvî
Tu yî ji min ra evîn
Tu yî ji min ra malî

Şopa destên Te

Şopa destên te hê jî li ser sînga min e

Tê bîra te?

Wê şeva dawîn

Ez û te

Di nav nivînên hevreşîmî de

Wê pevşabûna me ya dawîn

Wan ramûsanên şermokî ji bîra min naçin

Û wê şopa destê te

Ez im ji te ra rê

Tu nebû yî ji min ra rêwî û hem rê heval

Ez im ji te ra çem

Tu nebû yî ji min ra av û hem pire

Ez im ji te ra dar

Tu nebû yî ji min ra sî û hem fêkî

Ez im ji te ra tav

Tu nebû yî ji min ra tîr û hem germ